

Nameya parlementerên swêdî bo Serokomar Gül

Îro li ser navê Partiya Çep ya Swêdê (Vänster Partiet), parlementera çalak Amineh Kakabaveh û Parlamanter Hans Lindeyê ku ji xebatên xwe yê di komîsyona parlamentoya Swêdê pirsên derve, tê nasîn, nameyek nerazîbûnê ku regek protestoyî jî hemêz dike, ji serokomarê Turkiyê Abdullah Gul re şandin.

Herdu parlamenteran piştgirî dan endama şerefê ya Komela Mafê Mirovan li Turkiyê-IHD Yuksel Mutluyê, û nerazîbûna xwe li hemberî girtin û zîndanîkirina wê anîne zimên. Em nameya wan pêşkêşî we dikin.

Ji Abdullah Gul re...

Li gorî zaniyariyên gihîştîye navenda me, parêzvana mafê mirovan û endama Komela Mafê Mirovan li Turkiyê-IHD, Yuksel Mutlu hatiye girtin û li Bergamayê hatiye zîndanîkirin.

Sedema girtina wê bêhtir ji ber amadekirina raporekî bû. Mutluyê bi rêya raporê, buyera kûştina 47 kesan li aliyê Çiyayê Maziye, ronî kiribû.

Wê, di dema amadekirina raporê de bi xizmên kûştîyan, waliyê Mêrdinê, komeleyên mafê mirovan, bi partiyên polîtîk û yê civakî li herêma re qise kiribû, dîtina wan girtibû. Bi hevkarîya dezgehên din raporek li ser qetilkirina gundê Zangirdê nivîsî bû. Di raporê de, pir eşkere hatibû nîşandan ku, parêzvanên gundan (koy korucusu) berpirsiyartiya xwe bi şeweyekî xirab û bêqanûnî bi cî dihênin.

Piştî rapora dezgeha "Platforma jinan ji bo Aştiyek Berdewam", hêzên ewlakariya Turkiyê destpêkir ku zexta li ser wan zêde bike. Polîsan û hêzên ewlekariya Turkiyê bi rêya guhdarîkirina telefona Mutluyê, wê xistin bin tadeyiyê. Piştî ku Mutluyê girtin, sê rojan di hucreyê de hiştin, û paşê şandin zindana Bergamayê. Tiştên hatiye serê Mutluyê tev ji ber xebatên wê yên mafê mirovan in.

Mafê tevayên hemwelatiyan heye ku li ser pirsgerêkên civatê dîtinên xwe bihênin zimên û aliyên sergirtî eşkere bikin. Xebatên wisa bi giranî dikeve ser milê organîzasyonên mîna Platforma Jinan ji bo Aştiyek Berdewam û IHD ê, ku ew ji bo mafê mirovan xebatên bê westan dikin.

Bi rêya rawestandina xebat, rêlêgirtin, girtin û zêdekirina zêxta li ser xebatkarên mafê mirovan, û zîndanîkirina wan, mafê mirovan dikeve nav piyan, bendên wê tê bînpêkirin.

Em daxwaz dikin ku, Yuksel Mutlu bê şert û merc bê berdane

*Amineh Kakabaveh Parlemerter, Partiya Çep, Swêdê
Hans Linde, Parlemerter, Partiya Çep, Swêdê*

Wergêr: EuroKurd Human Rights- EHR, Stockholm